

# Ji bo mezinbûna bi saxlem ya zarokê we -

## „Zentrale Stelle Gesunde Kindheit“ (Navenda Tenduristiya Zarokan) xwe dide naskirin

Hemû dê û bav dixwazin ku zarokên wan saxlem mezin bibin. Ji bo piştgirîya mezinbûna saxlem, hemû zarokên ku di eyaleta Nordrhein-Westfalen da dijîn dikaarin deh car ji muayeneyê pêşemîn mifa verbigirin. Ji U1 (Piştî zayînê) heta U9 di sala şeşan yên jiyanê. Xercên testkirina liser milê sindoqa sîgorte ya xizmetên dermanî ye.

Bê îstîsna, hemû zarokên ku di eyaleta Nordrhein- Westfalen da dijîn divê bikaribin ev taybetiyane bikar bînin, ji ber vê „Zentrale Stelle Gesunde Kindheit“ tedawîyên naskirinên pêşwext, tomar dike. Ev kare wiha pêk tê: Ji bo hemû zarokên ku li yek ji şeş rêzikên tedawîyên naskirinên pêşwext (U5 heta U9) di navbera temenê şeş mehî heta pênc sal û nîv da beşdar dibin, bijîşk bawernameyekê ji „Zentrale Stelle Gesunde Kindheit“ dişîne. Ji ber ku gelek diqewime ku dê û bav dema tedawîyên naskirinên pêşwext ji bîr dikin an jî hinek dê û bavan qet agahiyên li ser tedawîyên naskirinên pêşwext tuna bin, „Zentrale Stelle Gesunde Kindheit“ hemû zarokên ku hê tedawîyan de beşdar nabin tomar dikin. Çend rojan piştî bidawî hatina dema ku tedawî diba têda pêk hatibina (li ser U5 14 rojan piştî bi dawî hatina pêvajoyê), dê û bavê nameyek bîranînê tê verbigrin.

Eger şeş hefteyan piştî nameya bibîrxistinê, ofîsa navendî encama vekolandinê wernegire, dê cihê mayîna berpirs were haydarkirin. Piştî, lijne dê derbarê berpirsyariya xwe ji bo çêkirin an çênekirina têkiliyê di gel dê û bavan û çawaniya vê têkiliyê biryar bide. Ev yek rê dide malbatê ku li gorî hewcetiyê piştgirî bike.

**Li vir hûn ê bêhtir agahdarîyan bidest bînin**

Zentrale Stelle Gesunde Kindheit
Telefon: 0234 91535-2222
(Saetên ximzetan: Duşemî – Pêncşemî saet 9:00-12:00)
Internet: www.gesunde-kindheit.nrw.de

Kurdisch, Stand: 02/2022

Landeszentrum Gesundheit Nordrhein-Westfalen